# Klamîdiya, agahdariya bo kesê nexweş

## Çima min ev agahî wergirt?

Hûn bi klamîdiya'yê ketine, yan jî guman heye ku hûn pê ketine. Li vir hûn agahdarî derbareyê klamîdiya'yê werdigirin, ku ev enfeksiyon çawa tê dermankirin û hûn hewce ne ku çi bikin çi nekin.

## Klamîdiya çi ye?

Klamîdiya nexweşiyeke belav e, ku ji hêla bakteriyekê ve çêdibe. Heger hûn vê vegirtibin, klamîdiya dikare li nav kîsê mîzê, li nav vajînayê û/yan li nav rektûm'ê (li rûviya dawîn) jî hebe. Carinan di qirikê de jî tê dîtin.

### Ma ez pê dihesim ku min klamîdiya heye?

Piranîya kesên bi vê enfeksiyonê ketine, li cem wan tu nîşan nîn in, ango hûn pê nahesin ku enfeksiyona we heye. Hûn dikarin ji bo demeke dirêj, carinan jî çend salan, bêyî ku haya we jê hebe bi klamîdiya'yê ketibin.

Hin kes dema ku dimîzin dibe ku piçek sivik biêşin.

Dibe ku li jêra zikê jinan de derçûneka xwînî û/yan êş hebe. Li cem mêran dibe ku ji kîsê mîza wan derçûneke spî ya zelal biherike û gunê wan biêşe. Heger we têkiliya seksî ya anal pêk anîbe, dibe ku hingê ji rektûmê jî derçûn hebe.

### Ma klamîdiya bi xeter e?

Bêyî tedawiyê, jin dikarin zirarê bidin lûleyên hêkên xwe, ku dikare derfeta ducanîbûnê dijwar bike. Her wisa jî dikare bibe sedem ku embîriyo li derveyî malzarokê (ducanîbûna ektopîkî) biafire. Li cem mêran dikare enfeksiyonek li nav gunê wan peyda bibe. Klamîdiya dikare bibe sedema enfeksiyona li nav çavan û carinan jî êşa movikan peyda bike.

## Klamîdiya çawa derbasî mirov dibe?

Klamîdiya di serî de bi têkiliya cinsî ya bêparastin, bi têkiliya anal an seksa oral tê wergirtin. Ew dikare li dema seksa mistdan û bi pêlîstokên seksê re jî derbasî mirov bibe. Herçendî nîşanên we tunebin jî, klamîdiya dîsan dikare ji we derbasî yekî din bibe.

Hûn li dij klamîdiya'yê bexşandî (parastî) nabin û her wisa jî hûn dikarin çend caran li ser hev bi klamîdiya'yê bikevin.

Klamîdiya bi riya cil, pêşgîr û tuwaletan derbasî mirov **nabe**.

## Klamîdiya çawa tê dermankirin û ta kengî ez dikarim vê enfeksiyonê derbasî yekî din bikim?

Klamîdiya bi antîbiyotîkan (tabletan) tê dermankirin. Tedawî belaş e. Heger hûn tabletan wekî ku divê bixwun û şîretên ku ji we re hatine dayîn bişopînin dê enfeksiyon winda bibe. Deh roj piştî ku we dest bi girtina tabletên antîbiyotîk kir, êdî enfeksiyon li nik we nîn e. Heger we dermanê xwe girtibe, ne pêwîst e, ku hûn tehlîleka din bikin, da ku hûn bizanin ka enfeksiyon maye nemaye. Lêbelê, heger hûn ducanî ne, pêwîst e hûn tehlîleka din bikin.

## Ji bo ez yekî din bi vê enfeksiyonê nexim divê ez çi bifikirim?

Klamîdiya li gorî Qanûna Parastina Ji Enfeksiyonê nexweşiyeke gelemperî ya xeternak e. Ji bo kesên din vê enfeksiyonê negirin, ew ên ku bi klamîdiya re ketiye yan guman heye ku pê re hebe, ji ber vê yekê divê ewna hin rêzikên ku jê re dibêjin qaîdeyên liv û tevgerê bişopînin.

### Rêbazên tevgerê

- Divê hûn ji kesê ku pê re seksê dikin re bibêjin ku we klamîdiya heye/dibe ku we hebe.
- Divê hûn parastinê (kondom) bi kar bînin, heger berî ku tedawiya we/tehlîla we biqede hûn seksê bikin.
- Heger were xwestin divê hûn serdanekê nû ya bo tedawiyê bikin.

Heger we qaîdeyên liv û tevgerek dîtibe ku hûn difikirin xelet e, hûn dikarin bi doktorê nexweşiya enfeksiyonê ya li herêma xwe re têkilî daynin.

Heger dema hûn bi klamîdiya ne, divê hûn nekevin xetera ku kesekî din jî vê nexweşiyê ji we bigire. Tişta herî ewledar ew e ku hûn 10 rojan piştî ku hûn dest bi girtina tabletên antîbiyotîkê dikin, têkilî yan celebeke din a seksê nekin. Heger tu seksê bikî, divê tu ji wî kesî re bibêjî ku te klamîdiya heye û divê tu parastinê (kondomê) bi kar bînî.

## Şopandina enfeksiyonê

Pir girîng e ku mirov kesên bi klamîdiya’yê re ketine bibîne (tesbît bike) da ku ew bikarin tedawî bibin hem ji bo kêmkirina xetera zirardîtinê (li jor binêre), hem jî ji bo li nav mirovan pêşî li belavbûna enfeksiyonê were girtin.

Li gorî Qanûna Parastina Ji Enfeksiyonê, divê hûn beşdarî şopandina enfeksiyonê bibin. Ev tê wê wateyê ku divê hûn agahdarî bidin şopînerê enfeksiyonê ku we bi kê re seks kiriye. Carinan hewce dike ku hûn bi qasî salekê li pêdaçûna bûyerên pêşiyê bûne vegerin.

Tişta ku hûn vedibêjin nepenî (veşartî) ye û kesên ku hûn behsa wan dikin dê nizanibin hûn kî ne. Ji wan re tenê tê gotin ku divê ew xwe tehlîl bikin. Agehî jî di qeyda bijîjkî ya we de cih nagire, lê di nav belgeyeke taybetî ya ku jê re tê gotin; şopandina enfeksiyonê de wê hebe.

## Agahiyên bêhtir

Zêdetir agahdarî derbareyê klamîdiya’yê li ser malpera 1177, Youmo (ji bo kesên 13 heta 20 salî ku agahdariya bi zimanekî din dixwazin) û UMO (Servîsa Ciwanan a ser Înternetê) heye.

www.1177.se www.youmo.se www.umo.se

## Derbareyê pelgeya pêşîlêgirtina enfeksiyonê

Belavoka pêşîlêgirtina enfeksiyonê ji hêla Smittskyddsläkarföreningen (Komeleya Bijîjkên Wîlayetan a Pêşîlêgirtina Enfeksiyonê) ve hatî hilberandin û li seranserê welêt tê sepandin.